# Lênêrîna xwe / Dabînkirina şexsî

## Divê herî kêm ji bo du hefte li malê çi hebe?

Wekî ku di çar dîwarên xwe tatîla kampê ya 14-rojî bikin, plana xwe çê bikin:

- **Av**: dabînkirina acîl ya **du lîter şilemenî** ji bo du rojan ji herkesk re
- **Xiwarin**: xwarinên mayînde wek mînak şîşe / parastî (sebze û fêkî), dexl û berhemên baqilan, makarona, birinc, nanê tîrî, şekir, şîrê mayînde
- **Pereya kaş** (berhevoka kirîna heftane ya ducar di şekla banknotên piçûk û xûrdepere de - baş tê ewlekirin!)
- **Derman**: Kabîneya derman ya malê û dermanên bingehîn ên kesane (Mînak; derzîya nexweşîya şekir-Insulin)
- **Qutiya-Alîkariya-Destpêkê**
- **Berhemên-Paqijiyê**
- **Mûm, şemçe**
- **Amûra Radyoyê** (Radyoyê ku bi batarya an solarê dixebite) an Radyoya Crank
- **Bataryayên yedek**
- **Sobeya kampê, mazotê**
- **Tanka erebeyê baş hatibe tijekirin**
- Heke hewce be, **zad ji bo heywanan** (av, xwarin)
- Heke hewce be, **dar** ji bo germkirinê / ocax, kîsên razanê, betanî û kincên germ

**Di odeyên girtî de agirê vekirî çê nekin - metirsiya agir û xeniqandin û jehrîbûnê heye!**

# Agahiyên bêtir

## Agahî ji bo cîhê rûniştinê

Ji kerema xwe bi şaredarî an bajarê ku hûn lê dijîn re têkilî daynin da ku li ser plansaziya mehellî bêtir fêr bibin.

Agahiyên bêtir li ser parastina sivîl û tedbîran jî li ser malperên-Internet tên girtin

- ya navçeya Ostholstein di bin www.kreis-oh.de/katastrophenschutz de
- ya herêma Schleswig-Holstein di bin www.schleswig-holstein.de/katastrophenschutz de, her wiha
- ya Ofîsa Federal ji bo Parastina Sivîl û Alîkariya Afatê (BBK) di bin www.bbk.bund.de de

**Impressum**
Herausgeber: Kreis Ostholstein
Fachdienst Sicherheit und Ordnung
Lübecker Straße 41
23701 Eutin

Titelbild: pixabay.com
Grafik: Kreis Ostholstein, Kreis Recklinghausen
Stand: 12/2022

KREIS OSTHOLSTEIN




# Blackout

## Çi were kirin, heke **Elektrîk** qut bibe?

*Rêber ji bo tevger û dabînkirina şexsî*

*Parastina sivîl*

# Blackout

## Blackout çi ye?

Blackout têkçûnek elektrîkê ya demdirêj, bi piranî li seranserê welêt, têkçûna binesaziyê û têkçûna dabînkirinê ye. Têkçûnên herêmî bi gelemperî piştî çend seatan têne rastkirin, têkçûnên li seranserê welêt piştî çend rojan hingê têne rastkirin. Pêdivî ye ku têkçûnên teknîkî yên kurt (10 - 15 deqe) di dabînkirina elektrîkê de werin cûdakirin.

## Ez çewa Blackout´ê nas kişf dikim?

Elektrîk tenê li mala min an jî li devera min (tax, lampeyên kolanan) qut bûye?
Telefon, radyo û înternet hîn jî dixebitin?

# Hişyarî û agahdarî

## Sîstemên hişyariyê ji bo gel

Sîstema hişyariya mobîl "MoWaS": Bi ser van de agahdarî û hişyarî ji saziyên giştî ji App´ên cihêreng re dikarin werin şandin (mînak NINA).

## Çawa / li ku ez dikarim agahdariyên heyî bistînim?

- App´a hişyarkinê-NINA (*heta hingê ku daneyên mobîl dixebitin*)
- Cell Broadcast di qonqxa têstkirinê de ye (*heta hingê ku telefona desta dixebite*)
- Radyo (ya ku bi baterî an solarê rojê dixebite)
- Radyoya otomobîlê
- Heke hewce be, ragihandin bi rêya hoparlorê (mobîl)
- Şaredariyên bajêran / agahiyên daleqandî li cihên navendî

## Li herêmê nebûna elektrîkê tê çi wateyê?



**Nebûna ava vexwarinê**
Xwarinçêkirinê, Serşok, Tuwalet



**Nebûna Ronahiyê**
Ji lampeyên xwendinê bigire heya ronahiya kolanan



**Nebûna Sarkirinê**
Sarker, Dolaba qeşa



**Nebûna Muameleya Pere**
Makîna peran, Kasa peran, Muameleyên peredana, Stasyonên petrolê



**Nebûna Komunîkasyonê**
Telefona desta, Telefon, Internet Televizîyon, Banqa alîkariyê



**Nebûna kirîn û firotinê**
Xûrek, Vexwarin, Supermarkêt, Tevgera eşyayan



**Nebûna Sofajê**
Tavbet û Gistî



**Nebûna Dermanê**
Dermanên awerte, Nexwesan

# Xalên Agahdariya Acîl

**Aramiyê biparêzin û bi baldarî tevbigerin!**

## Xalên Agahdariya Acîl li Ostholstein

Ji kerema xwe derbarê cihên Xalên Agahdariya Acîl de ji şaredariya xwe ya mehellî an bajarê xwe agahiyan bistînin.




**Xalên Agahdariya Acîl van tiştan pêşkêş dikin:**

- Xala serîlêdanê ji bo rewşên acîl / bangên acîl (Li şûna 112/110)
- Agahiyên fermî yên heyî li ser rewşa giştî

Ji kerema xwe ji **niha ve / bi rêkûpêk** malpera rêveberiya xweya mehellî kontrol bikin da ku bibînin ka kîjan xalên agahdariya acîl, xalên têkiliyê, agahdarî û pêşniyarên taybetî li wir hatine xuyakirin.
**Ji kerema xwe agahiyên xwe di vê derbarê de berdewam nûve bikin.**

Navçeya OH´ê û bajarokên navçeyên wê, ofîsên hikûmetê û şaredariyan amadekariyan dikin.
Ji kerema xwe li ser mijara qutbûna elektrîkê agahiyan, ji bo mînak, ji malpera BBK bigrin:
(https://www.bbk.bund.de/DE/Warnung-Vorsorge/Tipps-Notsituationen/Stromausfall/stromausfall_node.html)
an li ser malpera navçeyê:
www.kreis-oh.de/katastrophenschutz